

GIRÊ MOZA
(ORKÊŞ)
PAYTEXTA HÛRIYAN



PEYVA WELAT

Hêviyên Sala Nû

Desteya sernivîs

Sala 2020an ji bo tevahiya cîhanê saleke pir nexweş bû, di vê salê de gelek krîz û derketin holê, di serî de nexweşiya Koronayê bû, ku bandoreke pir xerab û mezin li jiyana mirov kir. Vê vîrosa biçûk ya ku bi çavan nayê dîtîn dikarîbû şewazê jiyana mirovan bide guhertin û tevahiya dewletên cîhanê têxe rewşeke awarte. Wê dikarîbû bi hezaran ji mirovan bikuje, û bi sedema wê me gelek mirov, dost, hogir, heval û kesên navdar wenda kirin.

Ji bo rûbirûbûna vê vîrûsa biçûk hemû dewlet û timên bijîşkî ketin rewşa amadebasiyê, û hewil dan ku belavbûna wê ya lezgîn rawestînin û kontrol bikin, û dermanekî yan vaksînekê li dijî wê bibînin.

Vîrûsa koronayê bandor li rewşa mirovî û aboriya hemû dewletên cîhanê kir, û jiyana mirov pûç kir, û ew neçar kir ku demeke dirêj li mala xwe rûne û jê dernekeve.

Li devera me jî, li Sûriyê û rojavayê Kurdistanê sala 2020an saleke pir xerab bûye. Wekî li tevahiya cîhanê, li devera me jî vîrûsa Koronayê belav bû û bi dasa mirinê gelek giyan çinîn. Li devereke wisa ku krîza şer û nearamiyê lê berdewam dike bandora nexweşiyê xurtir bû û imkan û karînen rûbirûbûna wê pir lawaz bûn. Krîza Sûriyê û şerê qirêj berdewam kir, bi taybetî li deverên rojavayê Kurdistanê êrîşên dewleta Tirk û rêxistina Daîşê û hêzên radîkal li ser bajar û bajarokên kurdî berdewam kir.

Piştî dagîrkirina Serê Kaniyê û Girê Spî jê hêla dewleta Tirk û çeteyên bi ser ve, rewş aloztir bû, bi hezaran kes koçber bûn, û di kampên koçberan de bi cih bûn, û rewşa mirovî li devera kurdî pir xerab bû. berdewamiya gef û êrîşan li ser deverên kurdî, qutkirina ava vexwarinê jî hêla hêzên dagîrker rewş aloztir kir. Her weha gelek krîzên din derketin holê, mîna krîza avê, nan, sotemeniyê aramiya deverê û rewşa jiyana neştêcîhên wê xiste jê metirsiyê.

Di heman demê de hewildanên aliyên ku dijminahiya doza kurdî dikin û pîlanên wan ji bo têkbirina aramiya li deverên kurdî û peydakirina tevliheviyan li wan berdewam kir. Û asoyên çareserîya kirîza Sûriyê ya berdewam bi alî nediyariyê ve diçin.

Kovara WELAT
Çandî- Giştî- Mehane

Sernivîser:
Aras Yûsiv

Desteya rêvebir:
Imran Yûsiv

Dizayner:
Hesen Berzencî



Têbînî: mijarên ku di kovarê de belav dibin, nerîna xwediyê xwe ne û nivîskar berpîrê wê ye

Mafê çap û ji bergirtinê, ji kovara WELAT re, parastîne

ji bo têkiliyê:

welatpress2014@gmail.com

www.facebook.com/Dengekurdistanasurya

Bi hatina sala nû û bidawîbûna sala 2020 re hin asoyên hêviyan diyar dibin, vaksînek li dijî vîrûsa Koronayê hate dîtîn, vê yekê hêvî nûjen kirin ku ev nexweşî ber bi dawîbûnê ve diçe.

Bi hatina sala nû, em gelek hêviyan li ser girêdidin, hêviya me ew e ku di sala 2021an de çareserîyek ji krîza Sûriyê re bête dîtîn û dûmahîk li êş û azariyên gelê wê were. Di vê çareseriyê de mafê hemû pêkhatayan bête parastin û dawî li vî şerê qirêj were kirin. Aştî û aramî li Sûriyê belav bibe.

Hêviya me ew e ku Efrîn, Serê Kaniyê, Girê Spî û hemû deverên dagîrkirî bêne rizgarkirin û xelkên wê vegerin malên xwe li ser milk û samanê xwe.

Hêviya me ew e ku hemû krîzên jiyane li deverên me bêne çareserkirin û rewşa jiyane û xizmetguzariyê baş bibe.

Hêviya me ew e ku yekrêziya kurdî biçe serî û em ji avgirka nakokîyan û parçebûnê derkevin. Hêviya me ew e ku doza kurdî li Sûriyê çareser bibe û gelê me bi azadî û aştî li ser xaka xwe bijî. Hêviya me ew e ku xêr û xweşî, aştî û aramî li tevahiya cîhanê belav bibe.

تَبْنِي ثَوْرَةَ
adopt a revolution



JIYANNAMEYA ZAROKEKÎ KURD



Imran Yûsiv

Temenê min du sal û nîv e, Ez hîn nizamim du sal û nîv çuqas dirêj in, lê ez jê piştrast im ku ev dem têrê dike ku mirov ji vê jiyane bêzar bibe û hêviya mirineka zûwext di dilê wî de ji her tiştî mestir be.

Gava hîn di zikê dêya xwe de bûm, carcaran min axaftinên dê û bavê xwe dibihîstin. Wan gelek hêvî li ser hatina min girê didan. Min ji xwe re digot: Li wî gundê ku di hembêza Çiyayê Kurmênc de veniştiye û di wê mala ku hîn min bi çavên xwe nedîtiye, di nav zewiyên zeytûn û hinaran de, di hembêza dê û bavê min de, buhişteke li hêviya min e.

Berî hatina min a vê jiyane bi rojekê, min dengine biyan û metirsîdar bihîstin. wan denga aramiya ku ez tê de bûm rûxand, ez ji vê jiyane veceniqandim û xwesteka ku ez ji malzaroka dêya xwe derkevim di dilê min î biçûk de wêran bû.

Ji lorandina dêya min ya rojane, hin bûyerên wê roja reş di xeyala min de hatin çandin,

û birînek di kûrahiya giyanê min de kolandin:

De lorî lorî

Kurê min lorî

Bavê te kuştin

Dayik bi gorî

Ew leşkerên tirk

Bê ol, dil bi kîn

Li gel çeteyên hov

Dilreş û devbixwîn

Ketin gundê me

Mala me dizîn

Dara xweziyan

Ji kok de birrîn

Ne bav, ne mal, ne cih û ne war, para min ji vê jiyane ev bû berî ku temenê min destpê bike.

Li ser rêya koçberiya bi darê zorê, ez ji dayik bûm. Dêya min dibêje: Weke roja meşerê bû, kerwanek bêdawî ji laşan ji ber dojecha agirê top û firokeyan û hovemirovên xwînmij berê xwe dabûn nehênîyê. Kal û pîr, zarok û jinên ku dilên xwe yên bi darên zeytûnan ve daleqandî li pey xwe hiştibûn, ber bi çarenûseke nediyar ve gavên xwe yên wesityayî diavêtin.

Di nav wê lehîya mirovî de ez hatim jiyane. Kesekî ji bo hatina min nelîland, şekir û şêranî belav nekirin. Ta ez bi wî giriyê xwe yî pêşîn jî şa nebûm. Ma giriyê zarokekî nûjidayikbûyî di nav wê tabloya mirinê de wê çi wateyê bide !!!?

Wê şevê, di bin ezmanekî sar de, li ser zemîneke mest û xemdar, ez di hembêza dêya xwe de, nizamim razam, ne ji hiş

ketim.

Sibehîn, bi dengê firokeyên cengê û topên ku bi ser me de dibariyan re em şiyar bûn, me tirsaxwe li xwe pêça û ber bi derbiderbûneke dijwar de, em bi rê ve çûn.

Piştî êş û azariyeke dûr û dirêj em li kampekê hatin bicihkirin, xelata cîhanê ji bo me koneke penaberiyê bû. Ev bi xwe pêkenoka herî mezin bû, mal û mewdan, hêvî û pêşeroja me ji me standin, û bi navê mirovahiya rûreş konek diyarî me kirin.

Rûpelek din ji êş û azariyeke berdewam di jiyana min de vebû. Lê bi demê re ez û wê êşê û êzariyê bûne heval. Belê mirov dikare fêrî êşê bibe û dostaniyekê pê re girê bide. Dêya min dibêje ku dergûşa min pir xweşik bû, lê niha hevjinê dizê mala me zarokên xwe xistinê. Ne xem e, ji ber min dergûş di jiyana xwe nedîtiye û ez nizanîm ew çi ye. Tiştê ez dizanîm ku ev bo.....

Bibûrînî ez neçar im axaftina xwe bi dawî bikim. Bahoze aliyekî konê me xistiye, dêya min hewil dide ava ku niha wek lehiyê derbasî kon dibe bi sîtilekê derîne, bayekî dijwar li rûyê min dide, laşê min tevde şil bûye, ez dihisim xwîn di damarên min de hêdî hêdî qeşayê digire, av bi ser min dikeve, Hawar û qêrîna dêya min hin bi hin vedimire... ■



وبين التارتين (النوبتين) كانت تنطفئ شمعة أخرى من قناديل الشغف والأمل. في صباح إحدى الأيام المجهولة وأثناء تفقدها الروتيني للمرضى لم تر تلك المرأة المجنونة التي تتدعي وجود طلاسمر مرعبة في غرفتها، وقبل خروجها سمعت أننا يقول: (أنك تحترقين)

استدارت لترها مختبئة تحت السرير فهلعت لإخراجها وعندما جثت على ركبتيها رأت بأن وجهها و رقبتها ملطخين بالدماء، توحيان بمحاولة تهشيم الرأس وخرمشة الوجه بالأظافر.

سارعت إلى مناداة زملائها الذين جاؤوا وحملوا المريضة إلى غرفة الإنعاش. بينما اكتفت هي بالجلوس على السرير البارد فاقدة القدرة على الحراك غير قادرة على استيعاب ما حصل. و لوهلة لفت نظرها جدران الغرفة المغطاة بكلمات كئيبة و عبارات غامضة ومن بينها كانت عبارة "حرري روحك العالقة.." التي زادت من توترها فأصبحت تتنفس بصعوبة وأجهشت بالبكاء. شعرت و كأنها رسالة سريّة موجهة لها. في تلك اللحظة استجمعت قواها و انطلقت بسرعة صوب غرفة الإنعاش.

عندما دخلت الغرفة كانت المريضة تنازع الموت، عندما رأت الممرضة جحظت عيناها وصرخت قائلة: "أنا أيضاً كنت أحلم ذات الحلم.. كان الحبل يخنقني كل ليلة."

و كانت عبارتها الأخيرة قبل أن تفارق الحياة:

■ "حرري روحك العالقة.. لاتقبعي في مكاني"

شيزوفرينيا

آهين أوسمان



"هيجان" القلب أن تحترقي .. حرري روحك العالقة ،لاتقبعي في مكاني ..

هذا ما قيل لها عندما كانت تتهد باستمرار أثناء مجالستها لإحدى المريضات ..هرعت إلى الغرفة المجاورة، اتكأت على الحائط وملامح الرعب بادية على وجهها، أطلقت صرخة هلع و هي تحاول أن تقنع نفسها بأن تلك المرأة ليست سوى امرأة مجنونة ولا يجب أن تكثرث لأقوالها.


هي مجرد ممرضة تعمل في مشفى الأمراض العقلية، ينتهي عملها عند الساعة مساءً حال استلامها أجرتها اليومي. فتعود إلى المنزل لتخلق شجاراً بلا سبب مع أفراد أسرتها، ثم تتجه إلى فراشها و تنشج بالبكاء إلى أن تختطفها تلك الغفوة المعتادة ورؤيتها للكابوس ذاته كل ليلة لترى نفسها مرتديةً حبل المشنقة وسط متاهة مظلمة.

تستيقظ إثر الكابوس لتجد نفسها متسمة أمام المرأة وقطرات الندى عالقة في أطراف مقلتيها المحمرتين وكأن الوسادة لم تكن كافية لامتصاص دموع الأسى ... كانت على معرفة تامة وعلى يقين بأن هنالك شيئاً خفياً يستعر في داخلها كالجمر الثائر، يحرق أعصابها ويصيبها بنوبات جنونٍ وغضبٍ تارةً، وكالجمر المنطفئ حديثاً يعيدها إلى حالة السكون واللامبالاة تارةً أخرى.



Navenda Umer Hemdî Malva

Amadekar: Lava Îsa



Hevpeyvîn bi Rêzan Mişo ra Birêveberê Navenda Umer Hemdî -Malva-

Navenda Umer Hemdî -Malva-¹ yek ji wan navndan e ku li Qamişloyê barê perwerdekirina hunerên bedew avêtiye ser milên xwe. Her sal bi hejmareka baş ji şagirdan ra dibe alîkar daku behre û şîyanên xwe bi pêş biêxin û rê ji wan ra xweş dike ku li nav refên hunermendan cihê xwe bigirin.

Ji bo em baş vê navenda han binasin, me berê xwe da wir û bi armanca bidestxistina aghîyên pirtir, hevpeyvînek bi berpîrsê navendê ra pêk anî. Rêzan Mişo perwerdekar û Birêveberê Navendê, hindek ji dema xwe ji me ra veqetand û heta jê hat bersivên zelal ji bo pîrsên me raber kirin. Ji bo vê çendê jî em spasdarê wî ne.

○ Birêz Rêzan, berî ku em derbasî babetê karûbarên navendê bibin, dikarî ji me ra bibêjî çi girîngîya huner û wênesazîyê ji bo mirov û civakê heye?

Wênesazî ji destpêka dîrokê ve û heta roja me ya îro cihekê xwe yê taybet di jîyana civakan da girtiye. Em dibînin mirovên berê ji bo ku behsa jîyana xwe û çûn û hatina xwe herweha çûna nêçîrê bikin, bi rêya nîgarkêşîya li ser dîwarên şkeftan ev yek pêk înan. Tiştên ku ji şaristanîyên dêrîn mane û gihaştine me, hunerên wan in di nav da jî wênesazî. Li alîyekê din dema ku zarok dixwaze tiştê di hundirê xwe da derbirîne, heke mirov pênûsekê biêxe destê wê, yekem tiştê ku bike dê wênesazî be ku ne tenê zarok, lê belê hemû mirov dema dixwazin xwe derbirînin, ber bi wênesazîyê ve diçin. Halê hazir di civakan da wênesazî yan jî huner bi giştî bûye qetek ji jîyana mirovan; hem di milê aborîyî da hem jî di milê derberîne da.

○ Ji kengî ve navend ava bûye?

¹ Rûpela navendê li ser Facebookê, link: <https://www.facebook.com/MalvaCenter/>

Ji destpêka sala 2017an ve navenda me hatiye avakirin. Jixwe navend bi navê Umer Hemdî ye ku Hemdî hunermendekê cîhanî ye û kurê vê deverê ye; lewra me navandina navendê bi navê wî guncav dît.

○ Navend girêdayî kîjan alîyî ye yan jî ji hêla kê ve hatiya damezrandin?

Navend ne girêdayî tu alîyan e. Bi kedeka xweser hatiye damezrandin û heta weke niha bi wê kedê berdewam e. Herweha weke her sazîyê, rêdan (ruxset) ji alîyên peywendîdar bi dest xistiye.

○ Aramcên vekirina navendê çi ne? Navend kîjan huneran hînî perwerdegiran dike?

Navend cihek e ku mirov lê behreyên xwe bibîne û bi pêş biêxe. Aramcna vekirina navendê jî ew e ku rê ji kesên ku dixawzin xwe di vî milî da bi pêş biêxin, xweş bike û destekê bide wan daku xwedî li şîyanên xwe derkvî û bi pêş da herin.

Ji bo huneran, me pêşî bêhtir guh dida hunerên ciwan bi giştî; jixwe wênesazî, peykersazî û cartoon jî di nav da. Piştra me hin çalakîyên din pêk înan her wekî pêşkêşîyên sînemayê yên taybet bi hunerê û ev du sal in em bi zarokan ra kar dikin û wan fêrî kişandina wêneyan dikin.

○ Perwerde çend mehan dom dikin? Gelo navend bawernameyan dide derçûyan?

Perwerdeya wênesazîyê 16 mehan

dirêj dike û li ser çar pêvajoyan dabeş dibe; her pêvajoyek çar mehan dom dike. Kesê perwerdeyê bi dawî dike, bawernameya navendê werdigire.

Herweha perwerde ji bo kesên ku temenê wan 9-13 salan heye ku ev perwerde bi xwe sê mehan dirêj dike.

○ **Navend sazîyek e ku bê dirav perwerdeyê dide. Çawa hûn wê bi dirav dikin; her wekî cih, kel û pel û destmizê perwerdekaran (heke werdigirin)?**

Ji despêkê ve navend sazîyek e ku qezenckirin û diravan armanc nagire û dê weha jî bimîne. Em bi xwe navendê bi dirav dikin anku tu alî wê fînanse nake. Herweha perwerdekar jî xwebexş in û karê xwe bê berdêl dikin.

○ **Ji destpêka avakirina navendê ve û heta weke niha, çend şagird perwerde kirine?**

Hejmara şagirdên me gihaştiye nêzîkî "40" kesî ku ji navendê derçûne. Herweha hejmara zarokan jî 45-50 şagirdî ye ku li navendê perwerde dîtine.

○ **Gelo hûn tev li çî pêşangehan bûne yan ji we pêşangeh ji bo kevalên xwe amade kiriye?**

Helbet, me pêşangehek bi navê "Pêşangeha Malva ya Perwerdegir û Mamostayan" bi rê ve bir. Hem şagird hem mamosta bi proje û kevalên xwe tev lê bûn. Wekî din mamosta û şagirdên me bi tena xwe jî tev li pêşangehan dibin ku "Sempozyom" ya li Kobanê sala 2018an bi rê ve çû, yek ji wan pêşangehan bû.

○ **Li gorî we, gelo civak çawa li wênesazîyê û hunerên din dinhêre û heta kêjan radeyê girîngîyê dide wan? Bi giştî rewşa van huneran li rojavayê Kurdistan çî ye?**

Bi giştî li Rojavayê çûna gel ber bi hunerê ve ne di asta xwestî da ye. Lê hin tevger, pêşangeh û çalakî di milê hunerê da çêdibin ku ev tevgerê erênî ye û em jî dixwazin beşek ji vê tevgerê bin û wê bi pêş biêxin. Civak hin bi hin dê ber bi hunerê ve were; çimkî huner dê sûdê di her milî da dide mirov, bi

taybetî di milê aborîyî da.

○ **Ji bo bipêşxistina van huneran çî dihê xwestin? Divê alîyên peywendîdar çî bikin?**

Herçiqas peymangeh û navendên girêdayî perwerdekirina van huneran pirtir bibin, ewqasî dê li warê me bi pêş bikevin. Pê ra jî çalakîyên hunerî zêdetir bibin. Herweha piştgirîya madî û manewî ji bo navendên ku têkildarî vî karî ne û wênesaz û hunermendan hebe; ji bo ku dernekevin derve û li kar negerin, li welatê xwe bikarin tiştêkî bikin. Bi bawerîya min kirîna kevalên wênesazan jî dê heta astekê vê tevgerê çalak bike. Projeyên hunerî werin lidarxistin û tê da piştvanîya behremendan bihê kirin.

○ **Çî plansazî û pirojeyên we ji bo paşerojê hene?**

Em "Malva Studio" ava dikin. Studioyeka taybet bi derçûyên navendê ye ku lê kar bikin. Di studioyê bi xwe da jî hin piroje dê hebin herwekî cartoon û dîzayîna pirtûkan. Amadekarî ji bo avakirina pêşangeheka taybet bi navendê hene anku tenê ji bo pêşkêşkirina kevalan be. Herweha niha komêk bi navê Malva Photo ji perwerdegirên navendê ava dibe. Karê wan girtina wêneyan û pêveajotina wan e.

Dawîya hevpeyvînê m. Rêzan spasîya xwe ji Kovara Welatê ra raber kir û tekez kir ku her dem derîyê navendê ji her kesê ku dixwaze behereyên xwe bi pêş biêxe, vekirî ye û ew amade ne alîkarîya wî/wê bikin û şîyan û karîna wî li pêş biêxin. Herweha hêvîya xwe anî zimên ku guhdan bêhtir bi tevgera hunerî li rojavayê Kurdistanê bibe. ■



LUQMAN EBDULREHMAN:

*"Helbesta kurdî bi giştî
îro hîn negihîştîye asta
helbesta cîhanî"*



Hevpeyvîn: Imran Yûsiv

8 **H**elbestvan Luqman Abdulrehman, di sala 1973 an de jidayik bûye, fakulteya perwerdeyê di zanîngeha Feratê de xwendîye, di sala 2007 an de pirtûkek wî bi navnîşana (Zihûr Elewsec) bi zimanê Erebi hatiye çapkirin. Pirtûkek din bi zimanê kurdî bi navê (Sîya Avê), di sala 2019an de hatiye çapkirin. Du pirtûkên wî yên helbestî bi zimanê Erebi û yek bi zimanê kurdî wek destnivîs hene.

Çîroka we û nivîsê, kengî û çawa destpêkir, derbarê wan destpêkan tu çi dikarî ji me re bibêjî?

- Çîroka min û nivîsê ji sala 1992- 1993-an de destpêkir, wê gavê ez şagirtê zanîngehê bûm. Di destpêkê de min helbesta li ser movikan dinivîsand, lê min xwe di helbesta pexşane de bêtir didît û min bi vê şêwazê helbest nivîsîn.

Helbest ji bo we çi wateyê dide?

- Helbest jiyan e û jiyan tu çi dixwazî tê de heye, qîrîn, girî, şahî, ken, xem, şer û aştî ... bi giştî mirovantîya mirov dide xuyakirin .

Helbestvan ji kê re dinivîse ?

- Helbestvan di destpêkê de dibêje : Ez ji xwe re dinivîsim, ji bo ez xwe ji êş û derdên xwe vala bikim, yan jî şahîyê xwe binivîsim û weke destnivîsekê ji xwe re datînim, lê ev helbestvan an jî ev nivîskar bi rastî nikare bê xelkên dora xwe bijî, ji ber vê yekê dan û standin çêdibe û wan nivîsandinan ji kesên dora xwe re dibêje û wiha xwe dibîne ko ew ji civakê re û ji gel re dinivîse .

Hûn helbestê bi herdû zimanan (kurdî û Erebi) dinivîsin, bi dîtina we çi têkilî di navbera ziman û helbestê de heye?

- Helbest bi hemû zimanên cihanêhatîye nivîsandin, her zimanek taybetîyek wî heye, lê ez dibêjim zimanê helbestê gerek nazik be, nerim be, zelal be, û ez van taybetîyan di zimanê xwe de dibînim û ev yek ji mafê min e, ji ber vê yekê jî di çend salên dawî de dikarim bibêjim ku min bi zimanê Erebiî nenivîsandîye.


Di hûnandina helbesta xwe de hûn bêtir guhdanê bi çi dikin mijar û

naverok, an bedewbûn û aliyê hunerî ?

- Ev pirs pirseke pir giring e, ji ber divê em derbasî warê avakirina hlbetê bibin, em dikarin bibêjin ku helbest li ser sê stûnên sereke tê avakirin(raman, zar û mûzîk) û her yek ji van stûnan giringiyeke xwe ya taybet heye, ku yek ji van stûnan lawaz be, wê temenê wê helbestê kin be.

Tê zanîn ku karîn û şiyana we di warê rexneya wêjeyî de heye û bi taybetî di warê helbestê de, gelo çima nivîsên we di vî warî de tine ne, û tu rewşa rexneya wêjeyî li qada wêjeya kurdî çawa dinirxînî ?

Belê rast e, karekî weha heye, bi taybetî di warê helbestê de, bi hêvî me ku di demên pêş de bîne çapkirin... Rewşa rexneya wêjeyî di wêjeya kurdî de bi rastî gelkî lawaz e, ev jî ji ber bindestîya ku kurd tê de ne, û ji ber ku zimanê kurdî di demên bûrî de hatibû



qedexekirin, û helbet rexne jî ne karekî hesan e, da ku zû di nav nivîskaran de belav bibe. Tu dikarî bibêjî ku wêjeya kurdî bi xwe jî di van çend salên dawî de hema hema belav dibe, lê divê rexne bi awayekî pispor bête kirin, ligorî bingeheên rexneyê be. Bi giştî, em dikarin bibêjin ku rexne li qada wêjeya kurdî ta niha tune.

Hûn rewşa helbesta kurdî di dema îro de çawa dibînin?

Helbesta kurdî bi giştî îro hîn rûnenîştîye asta helbesta cihanî, gerek ew gavine hûr û kûr bi zanebûn û girnaî biavêje da ku bikaribe cihê xwe di nav helbesta cihanî de bibîne.

Ev jî li gorî tê xuyakirin pirsgirêkine wê hene, bi hêvî me ku zû bigihê refa helbesta cihanî.

Bi dîtina we , çawa helbesta kurdî dê li pêş bikeve?

Divê xwendin hebe, xwendina hlbesta kurdî ya resen çi ya movikan be çi jî ya pêlewaz be, gava em dibêjin helbesta resen em dibêjin li kevnê xwe vegerin , li filiklora xwe vegerin, li xwezaya



xwe û dîroka xwe vegerin, hev rexne bikin, helbestê zimanên din jî bixwînin, divê derî vekirî be ji hemû rengan re, ev tev bê berdewamî nabin.

Gotina we ya dawî ?

Bi hêvî me ku wêjeya kurdî rokê ji rojan ya yekem be di cîhanê de, û spas ji we û kovara we re li ser vê hevpeyvînê, her serkeftî bin. ■



MIHEMED EMÎN ZEKÎ BEG (1880 – 1958)

Yekemîn dîrokzanê kurd di serdema nûjen de ye, ku bi rengê zanistî dîroka gelê kurd nivîsandiye. Pirtûka wî ya bi navê (Dîroka Kurd û Kurdistanê) ji hemû dîroknas û lêkolîneran ku guhdanê bi dîroka kurdan dikin re jêderke serke û belgeyê dîrokî ya tekûz û cihê bawerîyê ye.

Ev pirtûka hêja li gel Şerefnameya Bedlîsî, ji bo naskirina dîroka kurdan du jêderên pir giranbuha ne. Di pêşgotina pirtûka xwe de, dîrokzan Mehemed Emîn Zekî dibêje ku sedema nivîsa wî ji vê pirtûkê re nepeydabûna zanyariyên akadîmî derbarê koka kurdan û dîroka wan de. û dibêje ku piştî hilweşîna Dewleta Osmanî hestên wî ên netewî xurtir bûn, lê wî tiştek derbarê dîroka gelê xwe û netewa xwe nizanîbû. Û piştî ku ji serokêl û zanyarên olî ên kurd pirsî, ew negihîste encameke tekûz û zanistî, lewra dest bi vê xebata xwe ya giranbuha kir.

Dîrokzanê bejinbilind M.E. Zekî dest bi lêkolîn û lêgerînê kir, û bi xebateke tekane û bi westan li pirtûkxaniyên Stembol, Elemanya û Ferensayê geriya, her weha seredana mozexaneyên kir û ji destnivîsên hin rojhilatnasan mîna lêkolîna rojhilatnasê rûsî Fladîmêr Mînoriskî sîd wergirt, û hin zanyarî ji dîrokzan Sîdnî Smîth wergirtin ku ew di wê demê de rêvebirê mala kevneşopîyan a Iraqî bû.

Bi vî awayî, piştî çend salan ji lêkolîn, xwendin û lêgerînê, vî dîrokzanê bejinbilind dikarîbû bigihîje teyoriya xwe derbarê koka kurdan. Ev toreya dibêje ku gelê kurd ji du katên gelan pêkhatîye. Kata yekem ew e ya ku ji mêj ve li mêj ve li Kurdistanê dijîn, û Zekî wan (Gelên Çiyayê Zagrosê) bi nav dike, û li gorî nêrîna dîrokzan ew ji van gelan pêktê: (Lolo, Kotî, Kortî, Cotî,

Cûdî, Kasayî, Soparî, Xaldî, Mîtanî, Hûrî, Nayrî) . kata duyem ew gelên Hino-Ewropî ne, yên di sedsalîya dehem ya berî zayînê de koçî Kurdistanê bûne, û li gel gelên wê yên resen bi cih bûne, û ew jî (Mîdî û Kardoxî) ne. wisa tevî gelên Kurdistanê ên resen bûne û mîletê kurd ji wan hatiye pêkhatin.

Hêjayî gotinê ye ku dîrokzan M.E.Zekî li bajarê Silêmaniyê yê başûrê Kurdistanê di sala 1880 de jidayik bûye. Destpêkê li ber destê mela Ezîz Zelzelî

li Silêmaniyê xwendina olî kiriye. Disala 1892an de derbasî dibistana Reşîdiyê li Silêmaniyê bûye. Di sala 1897 derbasî dibistana leşgerî li Bexdê bûye. Di sala 1899an de çûye Stembolê û li dibistana leşgerî xwendîye û di sala 1902an de jê derçûye. Di sala 1908an de wekî endam di komîteya nexşeyan de li Stembolê hatiye erdarkirin. Di sala 1910an de wekî endama di xêzkirina sînorên navbera dewleta osmanî û Bulgaryayê de hatiye kar kiriye. Di sala 1912an de beşdarî di şerê Belqanê de kiriye û ji bo xêzkirina sînorên navbera dewleta Osmanî û Rûsyayê de hate erdarkirin.

Di sala 1913an de û ji bo erkekî fermî çûye Ferensayê, û salekê li wir maye.

Piştî hilweşîna dewleta Osamanî vedigere Bexdê û di dibistana leşgerî de dibe mamoste. Her weha çend caran dibe wezîr, û dibe nûnerê wezareta bergiriyê ya Iraqê. Heft caran dibe parlamenter di perlemanê Iraqî de.

Di 10 tebaxa 1948an de li bajarê Silêmaniyê koça dawî kir.

Berhemên wî:

-Dîroka Kurd û Kurdistanê.

-Dîroka Silêmaniyê

-Dîroka Dewlet û Mîrneşîniyên Kurdî di serdema Islamî de. ■



- وضع مناهج تعليميّة جديدة لإعداد جيل واعٍ يقدر التعدّدية وينبذ التعصّب والعنصريّة..

- إيجاد أدوات إعلاميّة متطورة على جميع الأصعدة..

- نبذ كلّ أشكال التطرّف والتخلّف والتشدد في المجتمع عن طريق إقامة دورات تعليميّة وندوات تثقيفيّة..

* وهنا نشير إلى بعض الشّخصيّات التاريخيّة المتسامحة:

- صلاح الدّين الأيوبيّ الكرديّ المعروف بتسامحه وتعامله الإنسانيّ، يدخل بيت المقدس منتصراً، ولم يسفك دمًا، ولم ينهب جيشه منزلاً، وعامل النّاس بالرحمة، ولم ينتقم، وكان ذروة الأخلاق في الحضارة العالميّة.

- المهاتما غاندي: صاحب سياسة المقاومة السّلميّة (فلسفة اللاعنّف)، ومن أقواله: يتواجد الحُبّ حيث تتواجد الحياة.

- بابا الفاتيكان يوحنا بولص الثّاني: تعرّض لحادثة اغتيال عام ١٩٨١ من قبل تركيّ متعصّب؛ فخرج على أثرها بجروح بالغة، وأدخل المستشفى وخضع لعمليات جراحية كادت تودي بحياته، لكنّه بالرّغم من ذلك التقى بمن أراد اغتياله، وعفا عنه، وأخلى سبيله برحابة صدر!.

وبعد : إنّ ثقافة الاختلاف ومفهوم تقبّل الآخر هو شريعة تطوير القواسم المشتركة بين الإنسان وأخيه الإنسان، وإيجاد السّبل الكفيلة بتحقيق ذلك بما يساعد على العيش بسلام وأمن وطمأنينة، ويحفظ الإنسان من أن يحيا حياة الإبعاد والإقصاء ونكران الآخر؛ لهذا جاءت الدّعوة إلى الحوار بالتي هي أحسن، وسلوك الأساليب الحسنّة، والطّرق السّليمة في مخاطبة الآخر. ■

وينبغي أن نتعامل مع أيّ رأي بعقل منفتح ونستمع بتركيز لأسباب الطّرف الآخر، فهو أيضاً له الحقّ أن تكون له وجهة نظر وأن يعرّ عنها. والتّقد الدّائم للآخرين والاستخفاف برأيهم ليس من الشّجاعة وليس دليل قوّة، والصّوت العالي يُعدّ محاولة لإخفاء الضّعف وقلة الحجّة.

ولا بدّ من التّنبية والتّأكيد على أنّ حرّيّتك الشّخصيّة تنتهي بمجرد أن تبدأ حرّيّة الآخرين؛ حيث نصّت الشّرائع السّماويّة على ضرورة توفير هذا الحقّ لجميع النّاس، فالإنسان يولد حرّاً ويجب أن يعيش حرّاً.

ولا يتحقّق التّسامح وقبول الآخر، إلّا بالحوار والتّواصل، والمشاركة الحقيقيّة في اتّخاذ القرار؛ لأنّ إقامة حوار بناء، وخلق فضاء للتّقد والفكر المستقلّ يدفع بالمجتمع إلى حالة من الاستقرار والسّلام والتّعايش، مهما اختلفت أعراق ومعتقدات أبنائه.

والحوار والتّواصل هو الطّريق الصّحيح لحلّ القضايا كافّة، وهو البديل الصّحيح عن فرض الرّأي بالقوّة. وبالحوار نحافظ على التّواصل والمحبة والسّلام، ونعمّق معاني الديمقراطيّة والتّعاون.

ولا يكفي لنجاح الحوار مجرد الدّعوة إليه دون اتّخاذ خطوات عمليّة تترجم ما اتّفق عليه من قبل الأطراف المتحاورة على أرض الواقع.

والمجتمع المتجانس ثقافيّاً يتمتّع بقوّة مميزة خاصّة به، ويخلق مناخاً تشترك فيه الثقافات المختلفة لحوار مثمر يعود بالنّفع، ويساعد على إقامة حسن مجتمعيّ تكافليّ، وبذلك تسهل عمليّة التّواصل الدّاخليّ بين أبنائه.


ومن أجل العمل على نشر ثقافة قبول الآخر لابدّ

من:

- تبني برامج علميّة وذلك لتنمية وعي مجتمعيّ يقبل الاختلاف ويحترم الآخر..

ثقافة وحياة

علاء الدين حسن



الثقافة هي كل مرّكب يتضمّن العلوم، والأعراف، والعقائد، والفنون، والأخلاق، والقوانين، والمعتقدات والسلوكيات الاجتماعية، والعادات التي يُطلب تعلّمها والحدّق فيها، وهي النور الذي يشعّ في العقول أو الضمائر وهي يقظة للعقل والضمير الإنساني، والثقافة تبعث على الأمل، والإنسان المثقف يؤمّل للناس ويتمنّى لنفسه الأمان.

وتعدّ الثقافة عملية تراكمية تنامي لدى الناس مع تقادم الأعوام وفق التّشعّث الاجتماعية وما يتلقّونه من معارف، ويرتبط مفهوم الثقافة في العديد من المجتمعات الإنسانية بما هو مقبول لدى شريحة ما من مجتمع إنسانيّ ما، حيث يتميّز كلّ مجتمع من المجتمعات الإنسانية بأبعاده وخلفياته الثقافية المختلفة.

والمثقف هو ذلك الإنسان الذي يمارس العمل الذهني والعقلي، ويعنى بالتّفكير والتأمّل والتّخيل والإبداع المعرفي، وينتج الآداب والعلوم والفنون، ويخترع التّقنيات والآليات الماديّة والرّقمية.

والمثقف إنسان متعلّم، مهذب، يدرك الكثير من العلوم والمعارف والفنون، ذو ثقافة عالية، وليس كلّ مُتعلّم مثقف، ولكنّ كلّ مثقف مُتعلّم.

وكّلما زاد التّعاون بين مجتمع وآخر، زادت درجة البعث الثقافيّ، إلّا أنّ المجتمع الثقافيّ الأقوى يؤثّر بدرجة أكبر في المجتمع ذي الثقافة الأقلّ.

ومن خصائص الثقافة أنّها إنسانيّة، ومكتسبة؛ إذ يكتسب الإنسان الثقافة من مجتمعه، منذ ولادته وعبر مسيرة حياته، وذلك عبر الخبرات الشخصية. وبما أنّ كلّ مجتمع إنسانيّ يتميّز بثقافة معيّنة، محدّدة الزّمان والمكان؛ فإنّ الإنسان يكتسب ثقافة المجتمع الذي يعيش فيه منذ الصّغر، ولا تؤثر العوامل الفيزيولوجيّة في مسألة الاكتساب، أي أنّ عملية التّشعّث الاجتماعية الثقافية، هي التي تقوم بنقل ثقافة المجتمع إلى الطّفل.

ومن خصائص الثقافة أنّها اجتماعيّة، تطوّريّة/ تكاملية، ولا يتمّ التّطوّر في جوهر الثقافة ومحتواها فحسب، وإنّما أيضاً في الممارسة والطريقة العمليّة لسلوكيات الإنسان.

والثقافة بلا اختلاف، شجرة بلا ثمار، أو جسد بلا روح، مع الأخذ في الحسبان أنّ الاختلاف يفقد قيمته حينما يتحوّل إلى خلاف أو عدااء شخصي، فاختلاف الإنسان في رأيه مع الآخر، ميزة إيجابية قد تكشف لأحدهما أو لكليهما قصوراً ما؛ فيسارعان إلى إعادة النّظر فيما اختلفا فيه، فيدفع كلّ منهما نفسه أو الآخر إلى التّصويب.



MAYÎ Û ÇÎROKA FERHENGÊ

Gulal Kasanî

Taha Mayî di sala 1924`an de ji dayîk bûye, ew Kurê Şêx Mezher e, kurê Şêx Tahayê Mayî ye, ji malbateke oldar, rewşenbîr û zaniyar e, Bapîrê wî Şêx Tahayê Mayî ye, helbestvanekî kilasîkî navdar bûye.

Mayî, ji sedema ku Ingilîzan di wê heyamê de gundê Mayî dane ber topan û şewitandin bûn, di wê salê de mişextî qeza Çelê bûye.

Tahayê Mayî hizkerê xwendin û lêkolînê bû, ji ber ev ê çendê pirtûkxaneyê wî ya ku mezintirîn bû li herêma Behdîna, hejmara pirtûkên wê giheştiye 1500 pirtûkî.

Mayî ne tenê di warê xwenidin, vekolîn, û nivîsînê de zîrek bû lê belê di aliyê siyasî de jî jîr û zana bû; endamekî ji şandeya Kurdistanî bû; bo pîrozbahîya Şoreşa 14 Tîrmehê, û di 22`ê meha Tîrmehê sala 1958`an de çûye Bexdê bo dîdarekê digel serokê Iraqê Ebidlkerîm Qasim re bike.

Di sala 1973`an de bûye endamê Yekîtiya Nivserê Kurd şaxê Dihokê û di wê salê de Yekem car pişkdarî Mehrecana Helbesta Kurdî bûye.

Di sala 1985`an de rêjîma Îraqê destên xwe danî ser pirtûkxaneyê wî, ji sedema astengî û nexwşiyan koçberî herêma Hekarê û ji wir mişextî Îranê bûye lê di 30`ê meha cotmehê sala 1991`ê de, piştî Kurdistan ji sîxur, dam û dezgehên rêjîma Îraqê baqij bûye

vegeriyaye Bajarê Dihokê û li wir rûniştiye.

Helbestvan û Ferhengêr Mela Tahayê Mayî di sala 2010`an koça dawî kiriye

XWEZAYA GUNDÊ MAYÎ

Gundê Mayî, ji aliyê xwezayê ve gundekî navdar e derdora 50 kanî hene, pêlên ava wê li rûbar, deşt û zozanê deverê belav dibin, delav, best û golan av didin.

Bi hemû rengên daran, gul, kulîlk û heşînê tête dorpêckirin; mîna ristikên zêrîn li gerdena gundê Mayî rapêçane.

TÊKILIYA MAYÎ BI MALBATA BEDIRXANIYAN RE

Sala 1943`an têkilî di nav bera Tahayê Mayî û Mîrê Botanê Celadet Bedirxan de çê bûye, ew pêwendî bi rêya şandina nameyan re, rojnemeyên Hawar û Ronahî digehştin gundê mayî û bi vî awayî kar û xebatên hev ên wêjeyî û nivîskî dişopandin.


Ne tenê têkiliya wî bi Celadet Bedirxan re hebû, lê belê bi Dr.Kamîran Bedirxan re jî, hebû; di 18`ê meha Gulanê de Kamîran Bedirxan nameyekê digel rojnemeyên Roja Nû û Stêr bo Mayî dişîne gundê Mayî.

QONAXÊN DÎROKA FERHENGÊ MAYÎ

Meyî di dest pêka sala 1940`î de dest bi nivîsîna helbestan kiriye, her wisa dest bi berhevkirin û daneheva payv, bêje û gotinên kurdî yên kalepîran kiriye; bo amedekirina Ferhengeke Erebî-Kurdî.

Tahayê Mayî di pêşhatina Ferhenga xwe de wisa dibêje: Min li sala 1940`î dest bi xirîkirina van peyvên kir, demê pîr û kalêt me dîtîn hindêk peyvên dezanin û pê daxivin kesî dî ji bilî wan nedizandin û ne pê daxivin.. Min ku pêdivî ye ev peyv bihin parastin.

Lê ji sedema kewdan û gireftên siyasî û liv û bizava Kurdan li hember rêjîma Îraqê di wê hindê de rawista ye, ta sala 1972`an û ne dikarî berhemên xwe çap bik ra.



Li ser vê mijarê Mayî dibêje: Piştî ji berhevkirina Şi`rê Şa`irê bi nav û deng Ehmedê Nalbend serast bûm bo çapkirina dîwana wî li diwêv daxwaza Barzaniyê Nemir Mela Mistefa ...Rojekê min pirtûkxane bi serûber dikir destê min çû ser wan peyvan û ez bi ser hil bûm.

Û cardî Mayî dest bi tewawkirina Ferhengê kiriye, ew berhema ku dibîne ji arkê wî yê netewî ye, û divêt bi şêweyekî rêkûpêk bête berhevkin.

SOZÊN ÇAPKIRINÊ

Bo çapkirina Ferhengê soz bo wî dihatin dayin lê mixabin her carekê ew dilşikestî dima, û soz mîna pelên kelemper li ber bayê peyzan belawela dibû.

Sala 1987`an ji dijiwariya desthilat û ewlekariya rêjîma Îraqê koçberî Îranê bûye, ji aliyê rêjîma Îranê ve derfet nedaye ku Ferheng çab bibe.

Di sala 1991`ê Partiya Yekîtiya Nîştîmanî soz bi wî re dabûye

ku ev ê berhemê çap bike, lê mixabin ew jî neçûye serî. Sala 1994`an peymangeha Kurdî li Parîsê zoz bi wî re dabûye daku Ferheng çab bibe lê mixabin cardî reşpelika Ferhengê li wî vegeriye ..Dawî koça dawî kir û çavên wî têr nebûn ji berhema wî û merema wî ku Ferhengê liser refikên pirtûkaxaneya xwe bibîne, lê nedî.

MAYÎ, YEKEM FERHENG KURDÎ-EREBÎ YE

Ferhenga Tahayê Mayî ferhenga Yekem e Kurdî- Erebî ye; di nav Kurdan de hatiye berhevkin û emedekrin, lê mixabin her dema ku dixwest berhema xwe çap bike kelem û estengî li pêşiya karê wî der diket, dirawiste.

Ferhenga Mayî, berga wê pirr mezin e, ji 1049 rûpelan pêk têt, 25000 gotinên Kurdî yên sereke pêk têt û li beramberî wê jî peyvên Erebî yên sereke jî hemûyan digiheje 50000 peyv, lê ku hemû gotin werin hejmartin wê bigeheje derdora 125000 gotinên Kurdî û 250 gotinên Erebî.

Di sala 2009`an de li çapxaneya Spirez li bajarê Duhokê bi tîraja 1000 dane, Ferhenga Mayî hatiye çapkirin.

Berhemeke pir nirxdar e, ji ber ku di dirêjahiya 70`ê salî de li qonaxa sedsaliya 20`an de bêje, peyv û gotinên bapîr, dapîr û kalepîrên wê demê hatine berhevkin û wateya wan jî bi zimanê Erebî hatiye nivîsandin.

Ferhenga Mayî gencîneyeke pir zengîn e ji gotinên bav û kalan, dema ku merov li ferhengê vedigere xwezaya kurdistanê, deşt, zozan û cûbar ji me re daxivin û bi wateyeke zelal mîna ava rûbaran mebesta payvan û bingeha wan a xwezayî dide ber çavan. ■

FERHENGOK

mafnaş	حقوقي
dadwer	قاضي
dad	عدل
dadgeh	محكمة
darizandin	محاكمة
dozname	دعوى
siza	عقوبة
sûc	تهمة
sûcdar	متهم
tawan	جريمة
tawanbar	مجرم
bêşûc	بريء
parêzer	محامي
doz	قضية
berhingarî	دفاع
binçavkirin	توقيف
gilî	شكوى
lêpîrsîn	تحقيق
maf	حق
govan	شاهد





زمنٍ ألاً وفاءً ، لا حب
عالمٍ منافقٍ مزيف
زمنٍ لا حياة فيه
بل موتٌ بطيئٌ
بطريقه إلى الزوال
القاعُ قد ازدحمَ بالآثام



نبيهة حسين

أيتها الجبال الشامخة
كيف يمكنني إدراك قممك
كم من جهدٍ أحتاج
كم من وقتٍ أستغرق
أنظرُ لقممك وأحلمُ اني
هناك بالأعالي ملكٌ ذاتي
أشعرُ بالعزَّ والشموخ
أذوقُ الحرية
التحررَ من العبودية
أيتها الجبال العتية
كيف أمكنك البقاء شامخة
بوجه الرياح و الأعاصير
كيف لك الصمودُ بوجه المحن
انتظريني إلى أن
أرتقي قممك
وأحيا اللحظة
أنت هي تلك
الأسوارُ والحصون المنيعة
بزمنٍ لا صديقَ فيه و لا أمان
زمنٍ البشرُ فيه مهان
والسلطةُ بيد الغربان
ذئابٌ جائعةٌ متعطشة
وحوشٌ تحدقُ بالأحياء
لتنتهزَ الفرص للإفتراس
نحن بعالمٍ لا وعودَ فيه



PÊNC HELBESTÊN KAMÎRAN HIRSAN

Tê bîra min

Tê bîra min gava ez goşiyek tirî bûm,
teze û xweş
ji şaneşîna duhî hilawistî bûm.
Tê bîra min ku rojê xwe bi min şêrîn dikir,
û bayê hinarokên rûyê min miz didan,
gava sibeh diloqeke hingivîn bû,
hêsirên gulekê bû.
Ez vingînek bûm di şîrava wê de.
Min mêşên hingiv, perwane, û kêzikine zêrîn
ji asoyê re dipêjan.
Tê bîra min ku deng xuşxuşa cihokekê bû,
û dem zelaliya dîmenekê bû,
bêdengiyek bû ku ji kûrahiyê bang dikir.

Matman

Di kîmtê gengaziyên êşê de
ez mat dimînim,
guhişî bi wê ronahiya
ku ji jiyanê tê.

* * *



Wergêr: Şêrko Dakorî

Baraneke derbasbûyî

Her çar reben di tariyê de rawestî bûn,
ronahî ji bêdengiyê werdigirtin.
Dêr di rûyê wan de nedigeriya, û rebeneyên
jin
ne gondolek li ser avên asoyê bûn.
Xweşavek digivaştin û hinek ken kevn dikirin
ta ku xwedê were,
û dakeve ser wan wek ebeyeke şîn,
wek pirtikine sipî,
wek baraneke derbasbûyî,
ku ji nebûnê dibare.

* * *

Stêreke tenê li ezmanan

Stêreke tenê li ezmanan,
ji tariyê pê ve kes wê nabîne.
Ez nabînim.
Ez di erxebîlê tariyê de kesî nabînim,
ji pêvî xwe,
tîrêjan didim û wenda dibim.

* * *

Roj hew min dibîne

Ti wateya berbangê li cem min nemaye
Ez nema wê dibînim,
ez hew pê dihisim.
Roj bi germî min dadipelîne,
Lê bi min nahise.
Roj hew min dibîne.

* * *

Aso

II

Aso ne tenê ew tiştê li pêşiya te ye,
lê ew tiştê ku te li paş xwe jî hiştiye,
di himbêza nehestdariyê de
yan digel dostekê ku di geştê de bi te re bû.

Ez çiqasî ji vê hevrêyê hez dikim!
Ez çiqasî dixwazim dêmê wê bibînim
gava xwe bi alî min de diçemîne.
Ew qamîşê ku şekir jê da min
Di nav parsûyên min de şîn hat,

Û her ku dilê wê dibijîyê
ez jê re piyalekê jê digivêsim.
Ax hey piyala dagirtî û vala,
kanî nîvê te yê ku te soz dabû?
Tu çiqasî li bendî sozekê bû ku te pê re dabû,
biyano?
Û çend hêvî hatin avakirin û bêgaviya te geş
kirin?
Ax biyaniyê, tu çiqasî nas î di nav me de û em
çiqasî bi te kêfxweş in!
Ti devereke sar tine ye ku tu li nav nagerî
wek gurekî tekane
Ti bezd di tariyê de tine ye bê te,

Ax hey gurê di hindirê min de!
Ez çî dixwazim te bipişêfim, li xaçê bidim
li piş kaviîlê tenêbûna te û xewnên te yên ku
xewn man,
Radihêjin nameyên te yên hîçek yên tije soj û
ûzîna te,
Ew ûzîna dûdirêj a ku ne hêja ye tiştêkî!
Ax hey ûzîna dûdirêj, tu çiqasî hinava min
dişewitînî!
Req û serhişk,
ax tu çiqasî seyr î! ■

* * *

Kamîran Hirsan (sala 1969an hatiye dinyayê) helbestvan, wergêr, û romannivîsekî kurd e ji Amûdê, Kurdistanê Sûriyê. Kamîran Hirsan li zanîngeha Saint Petersburg li Rûsyayê toreya rûsî xwendiyê, û ji salên xwe yên sîpetiyê dest bi nivîsîna helbestan kir. Kamîran 8 dîwanên helbestan û 2 roman bi zimanê erebî nivîsîne û gellek helbest ji zimanê swêdî wergerandine erebî. Ew anha li bajarê Uppsala li Swêdê dijî.



Navenda Malva ya Hunera Şêwekariyê li Qamişlo



welatpress2014@gmail.com
www.facebook.com/Dengekurdistanasurya



ولات: مجلة شهرية ثقافية عامة

العدد (٧٧) ٢٠٢١/١/١ م